Peymangeha Navnetewî ya Şano ITI
Rêxaistina Cîhanî ya Hunerên Şanoyê

Nameya Roja Cîhanî ya Şano 27ê Avdarê 2025

Nivîskarê peyamê: Tiyodoros TERZOPOULOS, Yûnanî.
Derhênerê Şano, perwerdekar, Nivîskar, Damezrîner û Rêvebirê Hunerî yê kargeha Şanoyê Attis, Afrênerê Olempyadên Şanoyê û serokê komîteya Navnetewî ya Olempyadên Şanoyê.

Peyama Roja Cîhanî ya Şano 2025 bi pênûsa Tiyodoros TERZOPOULOS

Ma gelo şano di nav cîhana hemwelatiyên feqîr û xizan de, ku di nav çarçêweya cîhana nepenî de mane, ewên di nav taybetmendiyên xwe de xeniqî ne, di cîhanek hebûnên robotkirî ku di nav sîstemeke totalîter a kontrol û çewsandinê de li seranserê jiyanê mane, dikare guhdanê li bengewaziya hawara vê serdemê bike?

Ma gelo şano guhdanê li tunekirina jîngehê, gerimbûna gerdûnî, windabûna pirrengiya biyolojîk, qirêjiya oqyanosê, hilîna kendalên qeşayê, pirbûna şewatên daristanan û bûyerên hewayê yên giran dike? Gelo şano dikare bibe beşek çalak ji sîstema jîngehê? Şano bi salan e li bandora mirovan li ser rûyê zemînê temaşe dike, lê ew zehmetiyek mezin derbarê danûstandina bi vê pirsgirêkê re di bîne.

Gelo şano guhdanê li rewşa mirovî ya sedsala 21-an dike? Ku têde hemwelatî rastî lîstikên berjewndiyê siyasî, otonomî û dezgehên raghandinê li gel dezgehên çêkirina nerînên giştî dibe. Ku medyaya civakî biqasî ku ew wê hêsan dike, da bibe wek pira grêdana têkiliyan, ji ber ew rêya hêmin ya pêwîst bi kesên li hêla din re peyda dike?

Hesta tirsê ji kesên biyan û xwedî baweriyên cuda ya hişkere, kontrolê li ser raman û kiryarên me dike.

Ma şano dikare bibe workşopeke kar ji bo pêkvejiyanê bêyî ku matmayîna guncaw û bi birîn berçav were standin.

Matmayîna birîndar me vexwendî avakirina efsaneyê dike, û li gorî şîrovekirina Hayner Moler

“Efsane Komek e, makîneyek e, ku hertim makîneyên nû û cihêreng dikarin pê ve werin girêdan. Ew enerciyê vediguhêze ta ku leza mezin dighîne qada çandê û dihêle biteqe” û ez dixwazim qada berberiyê lê zêde bikim.

Ma gelo ronahiyên şanoyê dikarin pirskirêkên civakî yên tund, ronî bikin û dev ji ronîkirina xapînok ya ku dide canê xwe berde?

Ev hin pirsên ku tucarî rê ji bersivên tekez venakin, ji ber ku şano bi saya pirsên bêbersiv heye û dimîne.

Pirsên ku ji aliyê Diyonîsos ve hatine gengeşe kirin, ji cihê jidayikbûna wî, ta ku derbasî orkêstra şanoya kevnar dibe, her ligel rêwîtiya penaberan ya bêdeng di nav dîmenên şer de didomîne.

Îro di roja Şanoya Cîhanî de, werin em di çavên Diyonîsos, Xwedayê şano û efsaneyê, ku pêşeroj, îroroj û paşerojê dike yek, tevî ku ew bi xwe ew zarokê ku ji du zayînan çê bûye, ji Zîyos û Sêmêl, diyarkerê nasnameyên herikber, jin û mêr, hêrsdar û dilovan, Xweda yî û ajel î, li ser keviya di navbera dînbûn û aqilmendiyê de, sîstem û tevlîheviyê de, yê pehlewan li ser sînor di navbera mirin û jiyanê de, Diyonîsos pirseke hebûnê a bingegîn dike “ev hemî çiye?” Pirsek ku dike afrîner ber bi vekolînek herî kûr û berfereh li ser koka efsaneyê û pirrengiyên raza mirovî de biçe.

pêdiviya me bi rêyên vegotinê yên nû heye, ku armanca wê çandina bîranînê û avakirina berpirsyariyeke rewîştî û siyasî ya nû ye. Ji bo dûrketina ji dîktatoriya pirreng a serdema navîn a vê demê

Wergerandin: Lawîn Şêxo

Koma Şano
Syria/Qamişlo